Ev çirûsk dê wan bişewitîne

Leyla Guven ji bo rakirina tecrîdê çirûskek pêxist û ev çirûsk berbelav dibe. Tirsa desthilatdariyê zêde dibe

Hevseroka KCD'ê parlamenter Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 37 roj in di girtîgeha Tîpa E ya Amedê de di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Heta niha li Mêrsîn, Riha, Amed, Êlih û Wanê gelek rêveber û endamên HDP'ê yên ketin çalakiya greva birçîbûnê hatin binçavkirin. Li Ewropa, Başûr û Rojava grev dewam dikin... *RÛPEL - 3*

@rojname

14 Kanûn - În 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 204

Deng û rengê jinan; JIN TV

Televîzyona JIN TV a ku bi dirûşma 'Dengê Jinê Rûyê Jiyanê' di 8'ê Adara 2018'an de dest bi weşana testê kir û di 30'yê hezîranê de jî dest bi weşana xwe ya asayî kir, bi bernameyên xwe yên cur bi cur xwe digihîne jinan. JIN TV bi weşana xwe ya pirrengî dibe hest û ramana hemû jinên li cîhanê... *RÛPEL - 2*

Li dijî dagirkeriyê serhildana gelan

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dijî gefên dewleta tirk ên dagirkeriyê seferberî ragihand. Gelên herêmê li dijî gefan rabûn ser pêyan û meşiyan

TEMENÊ DAIŞ'Ê DIRÊJ DIKE

Serokê AKP'ê û serokkomarê tirk Tayyîp Erdogan got ku dê piştî çend rojan li hemberî bakurê Sûriyeyê û rojavayê Kurdistanê operasyona dagirkeriyê bidin destpêkirin. Gundên Rojava ji aliyê dewleta tirk ve hatin topbarankirin û li ser sînor liv û tevgera leşkerî zêde bû. Hat gotin ku Erdogan ji bo temenê DAIŞ'ê dirêj bike êrîşan pêk tîne. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dijî gefên êrîşên Erdogan seferberî ragihand.

KURD, EREB Û SURYAN MEŞIYAN

Li dijî gefên dewleta tirk ên dagirkeriyê di serî de li Qamişlo, Girê Spî, Serêkaniyê, Kobanê û li gelek navendên din ên Rojava kurd, ereb û suryanan meş li dar xistin. Endamê Konseya Rêveber a KNK'ê Zubeyîr Aydar jî da zanîn ku gefên Tirkiyeyê micid in, divê her kes helwestê nîşan bide. Partiyên siyasî yên Rojava têkildarî gefan daxuyaniyeke hevpar dan û diyar kirin ku dê li dijî êrîşan bibin yek... *RÛPEL - 3*

DYA û Rûsyayê der barê gefên dagirkeriyê de çi peyam dan... R 4

Qeza nîne qetlîam e

Li Enqereyê trêna lez qeza kir û di encamê de 3 jê makînîst 9 kesan jiyana xwe ji dest da û 47 kes jî birîndar bûn. Di nav kesên jiyana xwe ji dest dan de bernamzetê HDP'ê yê şaredariya Bozovaya Rihayê Yusuf Yetîm jî heye. HDP got ku ev qeza nîne qetlîam e.

Qeyûm cinîya makul xêz keno

Badê ke qayûm tayînê Şaredariya Bajarê Girdî ya Amedî bî qeza de zîhnîyetê xizmetê zayendperestî vejîya raşte. Wesayîtê ke eşteyê bajarî arê danî ser de fotografê cinîya ke destê aye de girrêşê pakî esta, ameyo zeliqnayene û seke tena cinî pakî kena yena nîşandayene...

KIRMANCKÎ - 5



Muxalefeta jinan bi pêş dikeve

Ji akademîsyenên îxrackirî Demet Bolat a hêjayî Xelata Lêkolînê ya Şîrîn Tekelî hat dîtin, diyar kir ku tevî ku jin di hemû qadên jiyanê de di bin êrîşan de ne jî muxalefetek girîng nîşan didin. Bolat bal kişand ser girîngiya xelatên ji bo lêkolînên femînîst...

JIN - 2

Demîrtaş: Min serî netewand

Danişîna doza hevserokê HDP'ê yê berê Selahattîn Demîrtaş di roja 2'yemîn de li salona danişînê ya li Kampusa Girtîgeha Sîncanê dewam kir. Demîrtaş got ku dadger di xizmeta desthilatdariyê de ye û 3 AKP'î, endamekî HDP'ê didarizînin. Demîrtaş got ku ger serî bitewanda niha li qesrê bû û heta hetayê jî girtî bimîne dê rûmeta xwe li erdê nexe.

AHMET AKTAŞ
Ji Tayyîp Erdogan dîsa gef... R/3

RAMAZAN OLÇEN
Şikandina tecrîdê şikestina Erdogan e... R/4



KAKŞAR OREMAR
Êdî dem hat... Hunermend Ahmet Kaya... R/6

www.rojhilat.org

Jinên der barê wan de lêpirsîn hat destpêkirin îfade dan

MÊRDÎN - Di çarçoveya çalakiyên 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê ya Cîhanê de jinên endamên Platforma Şahmaran a Mêrdînê bi çalakiyekê tundî şermezar kiribûn. Piştî çalakiyê li ser daxwaza waliyê Mêrdînê ji aliyê Serdozgeriya Komerê ya Mêrdînê ve der barê endama platformê Eylem Ergun bi hinceta 'propagandaya rêxistinê kiriye, dewleta tirk û netewa wê biçûk xistiye' lêpirsîn hatibû destpêkirin. Piştî Ergun derket holê ku dozger der barê 12 endamên platformê yên din de jî lêpirsîn daye destpêkirin. Kesên ku der barê wan de lêpirsîn hatiye vekirin li Midûriyeta Şaxa TEM'ê ya Mêrdînê îfadeyên wan hatin girtin.

Deng û rengê jinan xwe digihîne her derê

Xebatkarên televîzyona JIN TV'ê der barê weşanê de axivîn û diyar kirin ku ji bo jin xwe bi rengekî azad îfade bikin JIN TV gelek girîng e. Jinan da zanîn armanca wan ew e ku ew çîroka serkeftinê ya jinan bidin bihîstin û gotin ku ew bi weşanên rengîn xwe digihînin hemû jinan. Her wiha êdî jin dikarin televîzyona xwe li ser peyka Nîlsatê jî temaşe bikin

Televîzyona JIN TV'ê ku bi dirûşma 'Dengê Jinê Rûyê Jiyanê' di 8'ê Adara 2018'yan de dest bi weşana testê kir û di 30'yê Hezîranê de jî dest bi weşana xwe ya asayî kir, bi bernameyên xwe yên cur bi cur xwe digihîne jinan. JIN TV bi weşana xwe ya pirrengî dibe hest û ramana hemû jinên li cîhanê.

Der barê weşana JIN TV'ê de xebatkarên televîzyonê axivîn û anîn ziman ku ji bo jin xwe bi rengekî azad îfade bikin û derxin pêş JIN TV gelek girîng e. Xebatkara JIN TV'ê Mîdiya Melek diyar kir ku bi hezar salan e ku mêr bi çavekî biçûk li jinan dinihêrin û wiha got: "Ji bo keda jinê derkeve pêş û bibe dengê jinan JIN TV gelek taybet û girîng e. Jin bi saya vê televîzyonê sînorên ku ji wan re hatine xêzkirin hildiweşînin. Her çîrokek jinê ya xwedî wate û kedek mezin heye. Armanca me ew e ku em çîroka serkeftinê ya jinê bi civakê bide bihîstin."

Xebatkar Rodiya Hiso jî ev tişt anî ziman: "Xeyalên gelek jinan bi saya avakirina televizyona jinê JIN TV'ê pêk hatin. Em dixwazin deng û rengê jinê derxin pêş. Di rêya Gurbetellî, Nûjiyan û Dilîşanan de em ê şopa xwe ya ji bo azadiyê bidomînin. Jin bi hezar salan e ku bi tundiyê re rû bi rû dimînin. Bi JIN TV'ê re jin dengên xwe didin bihîstin û li dijî zilm û zextan derdikevin. JIN TV dengê jina azad û berxwedêr e."*QAMIŞLO*



Rodiya Hiso



Midiya Melek

JIN TV êdî li ser Nîlsatê ye

Ji aliyê din ve reng û dengê jinan JIN TV êdî li ser peyka Nîlsatê jî dê weşana xwe pêk bîne.

Hûn dikarin li ser van frekansan JIN TV'ê temaşe bikin;
Satellite and transponder: EUT8WB, TXP DAE 8,
Frequency and polarization: 11595MHz, Vertical,
S.R. : 27.500,
FEC 5/6
DVB-S, QPSK
Service name: JIN TV HD
SID: 2930
VPID: 2932
APID: 293

Tevî hemû êrîşan muxalefeta jinan bi pêş dikeve

Ji akademîsyenên hat îxrackirin Demet Bolat a hêjayî Xelata Lêkolînê ya Şîrîn Tekelî hat dîtin, diyar kir ku tevî ku hemû jin di qadên jiyanê de di bin êrîşan de ne jî muxalefetek girîng dikin.

Bolat bal kişand ser girîngiya xelatên ji bo lêkolînên femînîst û ev tişt anî ziman: "Îro hemû jin û femînîst di bin êrîşa gotinî de ne. Mînak li cihê em dibêjin 'wekheviya zayendî' desthilatdarî dibêje 'edeleta zayenda civakî.' Li cihê em dibêjin 'wekhevî' ew dibêjin 'cudabûna xwe dispêre fitratê'. Ji ber vê yekê jî hewl didin jinan hinek din kedî bikin."

Dibe potansiyelek cuda derkeve

Di axaftina xwe de Bolat da zanîn ku jin li her derê di dibin êrîşan de ne û wiha domand: "Qada cemaweriyê jî şûnde ketiye. Ji ber vê xelatkirina lêkolînên femînîst gelek girîng e. Di vê xalê de pêkanîna lêkolînên femînîst û jiyanên jinan gelek girîng in.Tevgera jinan û tevgera femînîst weke tevgerên din ên civakê dikarin gotinên xwe bibêjin. Dikare potansiyelek cuda derkeve holê."

'Jin dîsa xwe bi rêxistin dikin'

Her wiha Bolat daxuyand ku hemû aliyên muxalefeta civakê di bin tundiyeke micid de ne, nikara azad tevbigere û wiha anî ziman: "Bi girtina saziyên femînîst û jinan re hemû alî di bin êrîşê de ne. Tevî hemû êrîş û rejîma baviksalar, jin dîsa xwe bi rêxistin dikin." *STENBOL*

Jinên Efrînê dest bi çalakiyê kirin

Kongreya Star a Efrînê li gundê Babinis ê kantona Şehbayê bi armanca şermezarkirina tecrîdkirina li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya bi çalakiya Leyla Guven re ku ev 37 roj in didome, bi dirûşma 'Em ê girtîgeha Îmraliyê hilweşînin û bi rêber Ocalan re azad bijîn' çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin. 60 jin tev li çalakiyê bûn û dê çalakî 3 rojan berdewam bike.

Di çalakiyê de endama Koordînasyona Kongreya Star a kantona Efrînê Newroz Haşim axivî û destnîşan kir ku jinên Efrînê di qonaxa duyemîn a Berxwedana Serdemê de piştgiriyê didin çalakiya Leyla Guven û berxwedana wê ya di girtîgeha Amedê de silav dikin.

Haşim diyar kir ku dewleta tirk tu carî nikare îradeya gelê kurd û têkoşîna wan a ji bo azadiya Ocalan bişikînie û da zanîn ku dê têkoşîna xwe heta azadiya Ocalan bidomînin.

Her wiha di axaftinan de bang li jinan hat kirin ku rola xwe ya sereke ya di nav civakê de bilîzin û ji bo azadiya Ocalan têkoşîna xwe bilind bikin. *ŞEHBA*

Divê têkoşîna jinan berfireh bibe

Seroka berê ya Komeleya Piştgiya Namzetên Jin (KA.DER) Parêzer Seyhan Ekşîoglu û Zanista Siyasetê Prof. Dr. Fatmagul Berktay der barê guherînên mafên jinan de nirxandin kir.

Seyhan Ekşîoglu diyar kir ku tevgera jinan ji dema împaratoriya osmaniya heta niha hebûna xwe didomîne û da zanîn ku di demên dawîn de komxebatên dijberiya destkeftiyên jinan pêk tên û wiha got: "Di demên dawî de komxebat hat kirin û hukmên ji bo sînordarkirina nefeqeyê û tezmînata aborî hat danîn. Ev jî dibe sedema windabûna destkeftiyên jinan. Ciwan standarta jiyana îro ji bapîr û dapîrên xwe digirin. Ne tenê destkeftiyên jinan di her sektorê de maf tên binpêkirin."

Hemû qad li jinan hatine girtin

Prof. Dr. Fatmagul Berktay jî destnîşan kir ku qadên cemaweriyê li jinan hatine girtin û qadên siyasî jî hatine tengkirin û ev tişt anî ziman: "Di vê rewşê de jî çalakbûna jinan girîng e. Tevî her tiştî divê jin li Tirkiyeyê çalakiya sivîl bidomînin. Ji ber hawira aştiyê tune ye globalbûn zêde dibe. Ev globalbûn bandorê li jinan jî dike. Ji ber vê di navbera jinan de qutbûnek çêdibe. Di sedsala 21'emîn de li cîhan û Tirkiyeyê li dijî destkeftiyên jinan êrîş hene û li dijî vê jî divê tevgerên jinan têbikoşinê berfireh bikin. Li Tirkiye û cîhanê serdestiya mêr didome. Divê jin li dijî vê hişyar bin."*STENBOL*

'Jinên dîlgirtî rizgar bibin dê xelat hîn watedartir bibe'

Jina êzidî Nadiya Mûrad di 10'ê kanuna 2018'an de hêjayî Xelata Aştiyê ya Nobelê hat dîtin. Tevgera Azadiya Jinên Êzidî ya Şengal û Sîwana Meclisên Jinên Êzidî ya Ewropayê bi vê boneyê Nadiya Mûrad pîroz kirin. Her wiha daxwaz kirin ku ji bo rizgarkirina jinên dîlgirtî, li ser bingeha statuya Xweseriya Demokratîk a Şengalê têkoşîn were bilind kirin.

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku di 3'yê Tebaxa 2014'an de di kesayeta jinên êzidî de qirkirineke jinan di asta navneteweyî de pêk hat û wiha hat gotin: "Ev 4 sal e bi pêşengiya jinên êzidî li hemberî êrîşên hêzên dagirker yên navneteweyî berxwedanek mezin tê meşandin. Derfetên ku piştî fermanê di warê zanebûn û rêxistinbûyînê de bi nirxên mezin hatin bidestxistin, divê di qada navnetewî de esas were girtin. Çawa ku Nadiya Mûrad jî destnîşan dike xelata rûmetê ya aştiyê dema ku jinek dîlgirtî di destê DAIŞ'ê de nemîne dê wateya xwe bibîne, di heman demê de jî ji diyariya xelatê wêdetir ji bo me ya girîng di qada navneteweyî de qirkirina jina êzidî û civaka êzidî bi fermî were nas kirine ye."

Divê kesên sûcdar bên darizandin

Her wiha di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku divê kesên ku di qirkirina jin û civaka êzidî de cihê xwe girtine bên darizandin û daxuyanî wiha bi dawî bû: "Li ser vî esasî em biryara Neteweyên Yekbûyî ya der barê Şengalê de bi bîr dixin, divê demildest bi awayekî şênber êdî derbasî meriyetê bibe. Wê demê em ê diyariyên rûmetê bikaribin diyarî jinên têkoşer ên êzidî bikin û watedar bibe. Em di vê baweriyê de ne ku Nadiya Mûrad jî bi vê hişyarî û zanebûna erka xwe têkeve nava hewldanan û ji bo xweseriya demokratîk a Şengalê têkoşîna xwe hîn bilindtir bike. Ji ber ku em jin dema bi hev re têbikoşin em ê encamên hîn xurttir bi dest bixin." *ŞENGAL*

Ev 20 sal in bi baldarî çanda xwe diparêze

Tevî êrîş û zextên li ser Efrînê jina kurd a bi navê Meryem Elî ya 76 salî ya ji gundê Aqîbê yê Şehbayê bi hestiyarî çanda xwe ya kevnar dibe û xwedî li çanda xwe derdikeve.

Dayikê bal kişand ser zîhniyeta baviksalar a ku her dem nirxên jinan hedef digire û wiha got: "Jin ji dîrokê heta niha her dem rastî tundiya zîhniyeta baviksalar hatine. Lê tevî vê yekê dîsa jî dev ji parastina çanda xwe bernedane. Min jî gelek zehmetî kişand lê dîsa jî ez xwedî li keda destên xwe û li çanda xwe derketim. Ez ji dapîr û bapîrê xwe hîn bûm. Di heman demê de ez bi çandiniyê re jî mijûl dibûm. Ez gelek ji xebatê û têkoşîna jiyanê hez dikim."

'Çand hebûn û nasname ye'

Dayika Meryem diyar kir ku çand hebûn û nasnameya gelan e û ev tişt anî ziman: "Dewleta tirk bi tank û topên xwe êrîşî Efrînê kir da ku çanda kurdan tune bike. Lê em ê her ji bo parastina çanda xwe li ber xwe bidin û rê nedin dagirkeran. Tu caran dewleta tirk a dagirker wê nikaribe çand û dîroka gelê kurd qir bike, parastina çanda gelê kurd dê her berdewam bike û em ê wekî jinên Efrînê heta dawiyê li ber xwe bidin. Ev 20 sal in ku ez ji çanda xwe ya kevnar re xizmetê dikim. Ji ber vê yekê ez gelek bextewar im." *ŞEHBA*

www.arsivedji.org

Gel li dijî gefan meşiyan

Bi dehhezaran şêniyên bakur û rojhilatê Sûriyeyê li dijî gefên dewleta tirk ên dagirkeriyê daketin qadan. Şêniyan dewleta tirk şermezar kir û gotin ku dê li dijî hemû êrîşan axa xwe biparêzin. Her wiha Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî seferberî ragihand

Ji bo şermezarkirina gefên serokê AKP'ê Recep Tayyîp Erdogan ên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyeyê, bi dehhezaran pêkhateyên Serêkaniyê, Qamişlo, Girkê Legê, Girê Spî û Kobanê daketin qadan û Erdogan şermezar kirin.

Li Serêkaniyê bi hezaran welatî ji ber avahiya Mala Gel a Serêkaniyê heta Çerxerêya Şehîdan meşeke girseyî li dar xist. Meşa welatiyan li Çerxerêya Şehîdan veguherî mîtîngê. Di mîtîngê de hevserokê Meclisa Herêma Serêkaniyê Luqman Îso axivî û ev tişt destnîşan kir: "Em îro û her wext bi hemû pêkhateyên xwe, li hemberî êrîşên dagirkeriya Erdogan amade ne. Em ê her tim li ber xwe bidin."

Li dijî gefan bibin yek

Li Qamişloyê jî bi hezaran kes daketin qadan û Erdogan şermezar kirin. Di çalakiyê de pêkhatiyên Qamişloyê ji gelê kurd ê bakurê Kurdistanê xwestin ku li dijî gefên dewleta tirk derkevin. Band li hezên kurdistanî hat kitin ku li hemû herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê serî hildin û li dijî gefan bibin yek.

Bi heman armacê bi sedan şêniyên navçeya Girkê Legê ya girêdayî Kantona Qamişloyê meşiyan. Meş ji qada Şehîd Xebat dest pê kir û li Qada Azadî veguherî mîtîngê. Li qada mîtîngê şêniyên navçeyê teqez kirin ku hemû şêniyên bakurê Sûriyeyê li hemberî êrîşên dewleta tirk li ber xwe bidin û axa xwe biparêzin.

Dê gel li ber xwe bide

Şêniyên kantona Girê Spî jî bi armanca şermezarkirina gefên dewleta tirk li dijî herêmên bakurê Sûriyeyê daketin qadan û teqez kirin ku gelê herêmê bi yekitiya xwe dê li dijî hemû dagirkeriya dewleta tirk bisekinin.

Her wiha bi heman armancê bi deh hezaran şêniyên herêma Firatê li bajarê Kobanê meşiyan. Girseya gel li qada Jina Azad heta Qada Şehîd Egîd a li nêzî sînorên Tirkiyeyê meşiyan. Meş li veguherî mitingê. Di mîtîngê de hat gotin ku dê gelên herêmê li dijî hemû êrîşên dewleta tirk li ber xwe bidin û bang li dewletên Koalîsyona Navdewletî kirin ku helwestên xwe li hemberî gefên Tirkiyeyê diyar bikin. ***QAMIŞLO***

Rêveberiya xweser li dijî êrîşan seferberî ragihand

Serokê giştî yê AKP'ê Tayyîp Erdogan du roj berê gefa dagirkirina bakur û rojhilatê Sûriyeyê xwar. Li ser gefên Erdogan, Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi daxuyaniyekê nivîskî weşand û serferberî ragihand. Têkildarî mijarê di heman demê de endamê Konseya Rêveber a KNK'ê Zubeyîr Aydar axivî û diyar kir ku hêz û saziyên kurdan ên li welat û derveyî welat dê di 15'ê kanûnê de li Brukselê bicivin.

Rêveberiya xweser di destpêka daxuyaniyê de gefên Erdogan ên li dijî herêmê şermezar kirin û got ku armanca Erdogan parçekirina yekitiye Sûriyeyê ye.

Divê gel rabin ser pêyan

Rêveberiya xweser ragihand ku daxuyaniyên dawî yên Erdogan, di heman demê destkeftiyên Koalîsyona Navneteweyî jî hedef digire û bang li qada navneteweyî kir ku li dijî gefan helwest nîşan bidin.

Her wiha rêveberî bang li hêzên demokratîk ên li herêmê û cîhanê kir ku li dijî van gefan li gel vîna gelê herêmê bisekinin û wiha bi dawî kir: "Em weke Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê seferberiyê radighînin û bang li hemû gelên Sûriyeyê yên xwedî şeref dikin ku bi yek destî li dijî siyasetên dagirkirinê yên dewleta tirk rabin."

KNK dê sibê bicive

Endamê Konseya Rêveber a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Zubeyîr Aydar jî der barê mijarê de axivî û da zanîn ku hêz û saziyên kurdan ên li welat û derveyî welat, dê di 15'ê kanûnê de li Brukselê ji bo gefên Erdogan ên li ser bakurê Sûriyeyê û biryara DYA'yê ya der barê 3 kadroyên pêşeng ên PKK'ê de bicivin. Aydar got ku wan ji bo helwesteke neteweyî jî pêwîstî bi civînekê dîtiye.

Bang hat kirin

Her wiha partiyên siyasî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî bi daxuyaniyên cuda gefên Erdogan şermezar kirin û bang li hemû hêzên cîhanê, gelê kurd û gelên Sûriyeyê kir ku li hemberî gefên Erdogan xwedî helwest bin. ***AMED***

Grevên birçîbûnê bi komên nû didomin

Çalakiyên greva birçîbûnê ya li dijî rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya bi Leyla Guven re ku ev 37 roj in di greva birçîbûnê de ye, li seranserê bajarên Kurdistan û Ewropayê didomin.

Di çarçoveya van çalakiyan de li navçeya Tirbespiyê ya girêdayî kantona Qamişloyê bi pêşengiya Kongreya Star û PYD'ê konê çalakiya greva birçîbûnê ya ji bo sê rojan hat vedan. Bi sedan şêniyên navçeyê berê xwe dan konê çalakiyê û diyar kirin ku daxwaza Guven daxwaza wan e û xwestin demildest tecrîd bi dawî bibe.

Di heman demê de çalakiya ku li Kobanê hatibû destpêkirin jî di roja 5'emîn de didome.

Li bajarên Ewropayê çalakî

Grevên birçîbûnê yên li paytexta Swêd Stockholmê û paytexta Danîmarka Kopenhagenê, bi tevlêbûna çalakgerên nû dewam dikin. Çalakiya her du bajaran ket roja xwe ya 8'emîn. Kurdistaniyên ku tev li çalakiyê bûn têkildarî tecrîdê belavokan belav dikin.

Li bajarê Marsîlya yê Fransayê jî çalakiya li dijî tecrîdê didome. Ji bo çalakiyê li ber walîtiya Marsîlyayê kon hatiye vedan û rojnameyên xwecihî jî serdana çalakgeran dikin.

Li bajarê Hannoverê yê Almanyayê jî kurdistanî ji bo balê bikişînin ser tecrîd û çalakiya Guven li ber HBF'ê kon vedan û belavok belav kirin. Di çalakiyê de hat gotin ku daxwaza Leyla Guven daxwaza gelê kurd e û ji bo xwedîderketina Ocalan bang li gelê kurd hat kirin.

Her wiha çalakiya li bajarê Hambûrg ê Almanayayê jî didome û her roj kurdistanî saet di navbera 16.00-17.00'an de li kolana Monckebergê stand datînin û belavokan belav dikin.

Ji aliyê din ve jî greva birçîbûnê ya li Adigeyê ya Federasyona Rûsyayê jî bi koma nû berdewam dike. ***AMED***

Heyet ji CPT'ê xwest ku tavilê biçe Îmraliyê

Komîteya Pêşîgirtina Li Îşkenceyê ya Konseya Ewropayê (CPT), yekane sazî ye ku dikare biçe girava Îmraliyê. Lê belê tevî tecrîda giran a li Îmraliyê jî, bi israr gavekê neavêje. Ji bo CPT biçe Îmraliyê serokê Rûmetê yê HDP'ê Ertûgrûl Kurkçu û nûnerê HDP'ê yê li saziyên Ewropayê Fayîk Yagizay, bi rayedarên sekreterya û maseya Tirkiyeyê ya CPT'ê re rûniştin.

Di hevdîtinê de heyet ji CPT'ê xwest ku demildest biçin Îmraliyê û der barê rewşa Ocalan de agahiyan bidin.

Rayedarên CPT'ê jî îdia kirin ku der barê rewşa Ocalan de ew bi rayedarên tirk re di nava 'diyalogeke aktîf' de ne lê li ser rewşa Ocalan tu agahî nedan.

CPT tevî bendewariyên gelê kurd jî beriya niha serdana girtîgehên li Tirkiyeyê kiribû lê bi Ocalan re hevdîtin nekiribû. ***STRASBOÛRG***

Li PE'yê li ser tecrîdê civîna çapemeniyê

Wekîlên li Parlamentoya Ewropayê (PE) li ser tecrîdê û grevên birçîbûnê civîna çapemeniyê li dar xistin. Seroka Koma Dostaniya Kurdan parlamentera çepgir Marîe-Chrîstîne Vergîat, parlamenterê ji Qibrisê Takîs Hadjîgeorgîoû û serokê Rûmetê yê HDP'ê Ertûgrûl Kurkçu tev li civîna çapemeniyê ya li PE'yê bûn.

Di civînê de hate ragihandin ku Guven tevî pirsgirêkên tenduristiyê jî dest bi greva birçîbûnê kiriye û ev grev hem li Kurdistanê hem jî li Ewropayê belav bûye û ji Parlamentoya Ewropayê hat xwestin ku hîn bêhtir giraniyê bide ser vê mijarê û hat xwestin ku li şûna tecrîdê rêya diyalogê bê bikaranîn. ***STRASBOÛRG***

Çirûska ku Guven pêxistiye dê wan jî bişewitîne

Çalakiya greva birçîbûnê ya hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven a li dijî tecrîdkirina Ocalan ket roja 37'an. Piştgiriya gel a ji bo Guven her ku diçe berbelav dibe û zext jî li ser vê piştgiriyê zêde dibin. Heta niha li Mêrsîn, Riha, Amed, Êlih û Wanê gelek rêveber û endamên HDP'ê yên ketin çalakiya greva birçîbûnê hatin binçavkirin.

Der barê çalakiyan de parlamenterê HDP'ê yê Dîlokê Mahmut Togrul û hevseroka Bajarê Edeneyê ya DBP'ê Şukran Efeturk nirxandin kirin.

Mahmut Togrul diyar kir ku ji bo şikandina tecrîda li ser Ocalan çirûska Guven pê xistiye bi piştgiriya gel veguheriye agirek mezin û wiha got: "Hikûmet ji gurkirina agir ditirse ku wan bişewitîne. Ji ber vê êrîş dike. Lê desthilatdarî bi zextan nikare gav bi me paşde bide avêtin. Berevajiyê vê dê têkoşîna me hîn xurttir bibe."

Şukran Efekturk jî da zanîn ku daxwaza Guven daxwaza hemû gelê kurd e û got ku dê ew vê daxwazê li her derê bînin ziman. ***DÎLOK - EDENE***

ŞÎROVE
Ahmet AKTAŞ
saktas25@hotmail.com

Ji Erdogan dîsa gef

Roja çarşemê R. Erdogan dîsa derket ber kamerayê û gef li kurdan xwar û got 'ez ê van rojan êrîşî ser rojhilatê Firatê' jî bikim.

Ji ber ku karê wî hemû li ser xwînrijiyê ye, siyaseta wî li ser şer û cengê hatiye damezirandin, di hemû axaftinên wî de xwîn ji devê wî diherike û hema hema her roj êrîşî ser filan cihî û bêvan cihî dike. Lewma gelek ne zelal e, ka kîjan axaftinên wî rast in, kîjan derew in?

Li gor dîtina min, hemû gotinên wî perçeyek ji projeya wî ya bingehîn e. Ji ber ku ew bi xwe li ser projeyê derket ser dika siyasetê û bi vê armancê hat ser desthilatiyê. Bi gotineke din; ew bi xwe projeya DYA'yê ye.

Dibe ku bi hinek axaftinên xwe, derdikeve derveyî sînorên projeyê. Carcaran, weke şanogerê bihemd an bêhemdê xwe, ji nivîsên senaryoyê dûr dikeve û ji derveyî senaryoyê hinek gotinan dike. Dibe ku hinek caran R. Erdogan jî wisa bê firên, derdikeve derveyî nivîsê û diaxive.

Lê li ser mijarên girîng û giran nikare ji sînorê senaryoyê derkeve. Lewma ez vê carê jî, weke hinek caran girîng dibînim û dibêjim ne dûrî senaryoya Amerîkayê ye. Ew fort û zimanê qebedayîtiya ku li dijî Amerîkayê bi kar tîne jî bi zanebûn e, lihevkirî ye, ji bo xapandina raya giştî ye.

Gumana xurt ew e ku ev gefa R. Erdogan ne bêyî agahiya DYA'yê ye, lê destûrek sînordar e û dibe ku armanca vê senoryoyê ev be:

Du mijarên girîng hene di vê senaryoya Amerîkayê de, ya yekê; dixwaze bi vê êrîşkariyê HSD'ê çavtirsiyayî bike, ji Rûsyayê bi tevayî dûr bixe û hîn pirtir bi xwe ve girê bide. Ya duduyan; bi vê şêwazê kurdan xurttir bi xwe ve girê bide, ji ber ku di cenga li dijî Îranê de jî kurd jê re lazim in, lê kurdên ne xwedî îradeyeke xurt, kurdên lawaz ên her dem hewcedarê wan!

Li aliyê din jî Rûsya, ENKS'ê dikişîne cem xwe, li gel wan, xwedêgiravî li ser dahatuya 'Sûriyeya nû şêwrê dikin! Ev jî ji aliyê xwe ve, bi vî awayî li dijî kurdên xwedî îrade yên HSD'ê şantajê dike, xwedêgiravî ditirsîne, ji bo ku bi xwe ve girê bide!

Bêguman a herî giring, li hemberî van senaryoyên gemar, qirêj ên li dijî mirovayê, karê bingehîn dîsa dikeve ser milê kurd û kurdistaniyan.

Weke her car tê gotin, divê mirov li ser felsefeya xwe ya bingehîn 'baweriya bi xwe', hîn xurtir hûr û kûr bixebite. Divê mirov hevgirtina gelê xwe li ser vê bingehê hîn bi hêztir bike. Xebata xwe ya dîplomasî û lobiyê hîn bi hostayî bide meşandin. Li hemberî lîstok û provakasyonan hîn bêhtir bi hişyarî tevbigere û hwd.

Ji aliyekî din ve jî berxwedan û hewldanên li hemberî tecrîda Rêbar Apo û êrîşên li ser têkoşer û pêşengên Tevgêra Azadiyê hene. Li ser vê bingehê greva birçîbûnê ya bêdorveger a ku Leyla Guven li zîndanê daye despêkirin 30 roj derbas kirin, bi pêşangiya wê di vê çarçovê de çalakiyên greva birçîbûnê li çar aliyê welat û derveyî welat, roj bi roj berfirehtir dibin.

Ev çalakiyeke gelek bi rûmet û watedar e. Şopdariya şoreşger û berxwedêrên mezin ên Zindana Amedê tîne bîra mirovan. Divê her kesên xwe niştimanperwer, demokrat û aştîxwaz dibînin, li her devera ku lê dijîn tev li van çalakiyan bibin û bi hemû derfetên xwe ve lê xwedî derkevin.

R. Erdogan û hevalbendên xwe yên dagirker û xayin hemû ji van çalakiyan û serhildanan gelekî ditirsin û ji xwe divê hîn bêhtir jî bitirsin û ev tirs wê siyaset û pergala wan a zilmê birûxîne.

www.arsivakurdi.org



Li gorî lêkolînên zanistî Tehran rûdinê!

LONDON - Kovara Natûre ya Îngilistanê ku lêkolînên zanistî tê de tên weşandin têkildarî paytexta Îranê Tehranê encamên lêkolîneke balkêş weşand. Li gorî lêkolîna ku ji aliyê zanistên alman ve hatiye kirin di navbera salên 2003 û 2017'an de 4 taxên li rojavayê Tehranê, hawirdora nêz a bajêr û qadên fireh ên cotkariyê salê 25 cm rûdinin. Di heman demê de deşta Waramin a li başûrê bajêr û balafirgeha bajêr jî bi qasî 5 cm rûniştine. Di lêkolînê de tê ragihandin ku ev ji ber gelheya wê ya zêde û bikaranîna zêde ya çavkaniyên binerdî pêk tê.

Amerîka gefên Erdogan qebûl nekir

Amerîka û Rûsyayê têkildarî gefên Erdogan ên dagirkirina bakurê Sûriyeyê daxuyanî dan. Amerîka destnîşan kir ku êrîşên yekalî yên li dijî bakurê Sûriyeyê nayên qebûlkirin. Rûsyayê jî tenê got ku ew wek Tirkiyeyê nafikirin

Serokkomarê Tirkiyeyê Recep Tayyîp Erdogan piştî serdana Nûnerê Taybet ê Amerîkayê yê Sûriyeyê James Jeffrey a Tirkiyeyê û serdana Musteşarê Saziya Îstîxbaratê ya Tikiryeyê (MÎT) Hakan Fîdan a Amerîkayê gefên xwe yên li hemberî Rojava û bakurê Suriyeyê zêde kir. Erdogan herî dawî roja çarşemê ragihand ku amadekariyên xwe yên dagirkirina bakurê Sûriyeyê temam kirine û dê di demeke nêz de êrîş bibin ser Hêzên Sûriyeya Demokratîk.

Van daxuyaniyên Erdogan hem ji aliyê Rêveberiya Bakurê Sûriyeyê û hem ji aliyê Amerîkayê ve rastî bertekan hat. Reveberiya Bakurê Sûriyeyê ragihand ku Erdogan bi armanca ku têkçûna DAIŞ'ê rawestîne hewl dide bakurê Sûriyeyê dagir bike. Her wiha rêveberiyê li dijî gefên Erdogan seferberî ragihand û ji gelên herêmê xwest ku li dijî gefên Erdogan dakevin qadan û meşên girseyî li dar bixin û di vê çarçoveyê de meşên girseyî pêk hatin.

Di derdê leşkerê xwe de ne

Her wiha berdevkê Wezareta Parastinê ya Amerîkayê (Pentagon) Sean Robertson jî li hemberî gefên Erdogan daxuyaniyek da û diyar kir ku êrîşên yekalî yên li dijî bakurê Sûriyeyê nayên qebûlkirin. Berfirehiya daxuyaniya Robertson wiha ye: "Her êrîşek leşkerî ya yekalî ku li dijî bakur û rojhilatê Suriyeyê, bi taybetî jî herêmên leşkerên Amerîka lê hene yan jî li deverek nêzî leşkerên me pêk were, dibe cihê fikaran û gavên bi vî awayî nayên qebûlkirin."

Wek Tirkiyeyê nafikirin!

Li aliyê Rûsyayê jî bi rêya berdevka wezareta xwe ya karên derve Mariya Zaharova têkildarî gefên Erdgoan daxuyaniyek da. Zaharova angaşt kir ku der barê bakurê Sûriyeyê bi Tirkiyeyê re di nav danûstandinan de ne û ev tişt anî ziman: "Rûsya û Tirkiye di her mijarê de wek hev nafikirin. Penasekirina me ya ji bo kurdan tê zanîn, di vê de tu guhertineke me tune ye. Di nirxandina bi rêgez a aliyê rûs a ji bo vê mijarê de tu guhertin pêk nehatiye."

Sûcê şer dike

Serokkomarê Tirkiyeyê Erdogan ji destpêka şerê Sûriyeyê ve bi komên çete yên mîna DAIŞ û El Qaîde re bi hevkarî tevdigere. Erdogan di nav demê de komên xwe yên çete ava kirî

û herî dawî di meha adarê de Efrîn dagir kir. Ji Cerablûsê heta Efrînê li deverên ku dewleta tirk dagir kirine û xistine bin kontrola xwe her roj bi rengekî sîstematîk sûcê şer tên kirin. Di nav sûcên şer de komkujî, înfaz, revandina mirovan, îşkence, tecawiz, talana mal û milk, koçberkirin û asîmîlasyon hene. ***WASINGTON - MOSKOV***

May ji partiya xwe baweriyê girt

Li Îngilistanê ji ber pirsgirêkên pêvajoya veqetîna ji Yekitiya Ewropayê (Brexît) di nav partiya desthilatdar Partiya Muhafazakar a ku serokwezîra Îngilistanê Theresa May serokatiya wê dike krîza siyasî derketibû. Gelek parlamenterên partiyê ji bo serokwezîra xwe May pêvajoya dengdayîna pêbaweriyê dabûn destpêkirin. Dengdayîn li koma partiyê ya li Kamara Avamê pêk hat.

May di dengdanê de ji 317 parlamenterî piştgirî ji 200 parlamenterî girt û li ser karê xwe ma. Her wiha 117 parlamenter jî ji ber helwesta wê ya Brxîtê dengê pênebaweriyê dan May û xwestin May ji peywira xwe îstifa bike. Beşeke girîng a li nava Partiya Muxafazakar di wê baweriyê de ne ku danûstandinên Brexîtê yên bi Yekitiya Ewropayê re tên kirin ne bi xêra Îngilistanê ne.

May a ku ji ber pêvajoya li dijî wê hat destpêkirin, rojên zor û zehmert derbas dike têkildarî hilbijartinên ku di sala 2022'an de li Îngilistanê pêk werin daxuyaniyek da. May aşkera kir ku dê di van hilbijartinan de ji bo serokwezîriya Îngilistanê careke din nebe namzet û dê xwe ji serokwezîriyê vekişîne. Divê Îngilistan di 29'ê adara 2019'an de ji nav YE'yê derkeve. ***LONDON***

Grîveaûx: 'Êlek Zer' çalakiya nekin!

Berdevkê Hikûmeta Fransayê Grîveaûx têkildarî çalakiyên 'Êlek Zer'an ên ku bi taybetî rojên şemiyê bi awayekî girseyî tên lidarxistin, daxuyaniyek da. Berdevk Grîveaûx êrîşa beriya çend rojan a li dijî bazara Noelê ya li bajarê Strazboûrgê kir hincet û ji çalakgeran xwest ku vê şemiyê çalakiyên xwe rawestînin û dernekevin kuçe û kolanan.

Grîveaûx angaşt kir ku wan wek hikûmet çalakiyên 'Êlek Zer'an qet qedexe nekirine û got ku zehmet e bi qedexebûnê pêşiya derketina çalakgeran a kuçe û kolanan bigirin. Çalakgeran guh neda vê banga Grîveaûx û bi daxuyaniyekê ragihandin ku dê roja şemiyê careke din derên kuçe û kolanan û ji bo daxwazin xwe çalakiyan li dar bixin.

Çalakiyên 'Êlek Zer'an roja 17'ê mijdarê bi daxwaza daxistina bacên li ser sotemeniyê dest pê kir û hê jî her rojên şemiyê tên lidarxistin. Li gorî agahiyên li ber dest heta niha di van çalakiyan de 3 kesan jiyana xwe ji dest daye û zêdetirî hezar kes jî ji ber mudaxaleyên polîsan birindar bûne. Her wiha di çalakiyan de herî kêm 4 hezar û 99 kes jî hatine binçavkirin.

Roja duşemê serokkomarê Fransayê Emmanuel Macron ji bo guhdarkirina daxwazên wan bi nûnerên çalakgeran û serokên sendîkayên Fransayê re hat gel hev. Macron di vê hevdîtina xwe de çalakgeran mafdar dît û sozên pêkanîna hin daxwazên wan da. Li gel ev sozên Macron jî çalakger pê bawer nebûn û bi biryar in ku çalakiyên xwe bidomînin.

Di heman roja ku Macron bi çalakgeran re rûniştibû li dijî bazara Noelê ku li qada herî girîng a bajarê Strazboûrgê ya Place Kleberê hatibû danîn, êrîşeke çekdarî pêk hatibû. Di vê êrîşê de herî kêm 3 kesan jiyana xwe ji dest dabû û 12 kes jî birîndar bûbûn. Piştî vê êrîşê plana têkoşîna li dijî terorê derketibû asta 'hişyariya êrîşên lezgîn'. ***PARÎS***

Şîrketa Rusyayê Rosneft ji Îranê vedikişe

Bandora danekirinên Amerîkayê yên li dijî Îranê didomin. Piştî bi dehan şîrketên welatên Ewropayê şîrketa Rûsyayê Rosneft ku yek ji mezintirîn şîrketên petrolê yên Rûsya û cîhanê ye peymana xwe ya bi Îranê re betal kir.

Ajansa Spûtnikê ya Rûsyayê têkildarî mijarê nûçeyek weşand û ragihand ku şîrketa Rosneft beriya niha bi Îranê re peymaneke bi qasî 30 milyar dolar îmze kiriye û bi gumana danekirinên Amerîkayê yên li ser Îranê paşde gav avêtiye û peymana xwe betal kiriye. Her wiha hat ragihandin ku şîrketê biryar daye ku dê careke din li Îranê kar neke.

Amerîkayê di meha mijdarê de li dijî Îranê danekirinên nû kirin meriyetê. Amerîka, Tirkiye û Iraq jî di nav de bi giştî 9 welatan ji van danekirinan bêrî kiribûn. ***TEHRAN***

ROSNEFT

CAMA CÎHAN
Ramazan OLÇEN
ramazanolcen@hotmail.com

Şikandina tecrîdê şikestina Erdogan e

Serokkomarê tirk Erdogan beriya du rojan li dijî rojavayê Kurdistanê gefên êrîşan xwarin. Ji sala 2015'an ve ye Erdogan hemû sindoqên hilbijartinê di bin siya çekan de datîne. Bi bilindkirina pêla şovenîzmê û bi zextan encama didixwaze jî radigihîne. Heta di hilbijartinên 24'ê hezîranê de wisa bêperwa tevgeriyan ku televîzyonekê hikûmetê hêj ji hilbijartinan re bi heftiyan dem hebû, encam ragihand.

Ev aliyekî gefên li dijî rojavayê welat e. Li aliyê din sedema esasî ew e ku li gel hemû zext, zilm û şerê qirêj ê dewleta tirk jî gelê Kurdistanê dev ji Rêber Abdullah Ocalan bernade. Tevgera Azadiyê ji bo sala 2019'an kampanya 'Em ê tecrîdê bişikînin, faşîzmê têk bibin û Kurdistanê azad bikin' daye destpêkirin. Şêrejina kurd Leyla Guven jî bi çalakiya xwe di heman demê de bû yek ji pêşengên vê kampanyayê. Îro ro ev kampanya bi xurtbûna çalakiyên kurdistaniyan li hemû cîhanê berbelav bûye.

Li pişt gefên Erdogan di heman demê de hêrsa mirovekî têkçûyî heye. Niha camêr difikire û dibêje; "Ev çi milletekî xerîb e . Li gel ewqas zilm û zorê li gel ewqas sal in ev tecrîd dewam dike jî dev ji Rêberê xwe bernadin." Ew çiqas li vê difikire, ewqas lê serwext dibe ku mirovekî biçûk e. Lê biçûkekî ku bi nexweşîna îktidarê ketiye. Li gorî min Erdogan rastiya Rêber Ocalan û milletê kurd baş fêhm kiriye. Dizane ku îktidara wî li ser tirsê hatiye avakirin. Lê dîwarên tirsê bi qasî dîwarên hezkirinê ne zexim in û ew jî bi vê yekê dizane.

Hasilî gefa herî mezin a li dijî milletekî ew e ku pêşeng û lîderekî wî were bêdengkirin, tasfiyekirin, tecrîdkirin, qetilkirin û hwd. yanî bi hemû cure êrîşan civak û lîder ji hev were qetandin. Ji destpêka pêvajoya pergala êşkenceyê ya li Îmraliyê ve kurd li dijî tecrîdê li qadan in. Heta îro ne bi tenê kurd xelkên ji etnîk û baweriyên din jî Ocalan weke rêberê xwe dibînin. Xwedî lê derdikevin. Ramanên wî di jiyanê de bi goşt û beden dikin.

Ya ku Erdogan û hêzên komploger ên navneteweyî dîn û har dike ev rastî ye. Belê rast e gefek heye û ev gef gelekî micid e jî. Bergirî û tedbîr divên. Lê lazim e neyê jibîrkirin heta pergala Îmraliyê, tecrîd dewam bike wê ev metirsî her tim hebin. Ji bo kurd bi rehetî serê xwe deynin ser balîfê lazim e pêşî tecrîd were şikandin. Dema Rêber Ocalan bi awayekî serbest derfeta xebatê peyde kir wê ev yek bi xwe re gelekî guherînên mezin jî pêk bîne.

Îcar wekî ku Rêber Ocalan digot lazim e gelê kurd jiyana xwe li gorî şer saz bikin û wê behre û qabîliyeta ku di gelek eniyan de bi hemwextî bikaribin têbikoşîn jî nîşan bidin. Helbet dema ku em dibêjin kurd em behsa hemû partî û siyasetên kurdî dikin. Da ku êrîşa li ser rêberekî êrîşa li dijî hemû kurdan e. Êrîşa li dijî beşeke welat êrîşa li dijî hemû welat e.

Ji ber vê qasê li gel tedbîrên ewlehiyê lazim e çalakiyên ji bo şikandina tecrîda li ser Rêber Ocalan were mezinkirin û li hemû cîhanê were berbelavkirin. Xelasî, felat û azadî bi şikandina tecrîdê pêkan e.

www.arsivakurdi.org

Kirmanckî
14 Kanûne 2018 Îne

Ekolojîya Tirkîye bi torbeyan baş nêbena

İZMİR - Wezîrîya Dorme û Şaristanî bi mehneya vernîgirewtişê êşinîya dorme torbeyê bi pere ke bî qanûn vete. No qanûn do 1ê çeleyê 2021î de mecburî bibo. Endamê Ekolojiyê yê Kongreya Demokratîke ya Şaran (HDK) Erol Çirakî qala qanûno ke ame vetiş kerd û va: "Hedefê yewin yê no qanûnî oyo ke hukmatê AKPyî rant bikero. Hukmatê AKPyî rantwerd o. Dest bido kamî raşte seba rantî erzeno. Yanî derdê AKPyî ekolojî nîyo. JES xozaya Kizilcakoyî xira keno û eke derdê AKPyî ekolojîyo wa qanûnan bivejo."

Qayûmê Amedî cinîya makul xêz keno

Badê ke qayûm tayînê Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî bî qeza de zîhnîyetê xizmetê zayendperestî vejîya raşte. Wesayîtê ke eşteyê bajarî arê danî ser de fotografê cinîya ke destê aye de girrêşê pakî esta, ameyo zeliqnayene û seke tena cinî pakî kena yena nîşandayene

Prosesê hukmato bîyaye yê 16 serran de zîhnîyetê zayendperestî aver şî û no proses de hezaran hedîseyê îstîsmarî ameyî cuyayîş. Wesayîtê eşteyan yê xizmeta Mudirîya Karê Pakî ya Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî wesayîtê eşteyan ser de fotografê cinîya ke destê aye de girrêşê pakî esta, daye zeliqnayene û rolê ke kolelî de cinîyan ser de ameyî ferzkerdiş ard vîr.

Badê ke 96 şaredarîyanê Partîya Herêmê Demokratîkî (DBP) rê qayûm ameyî tayînkerdiş, komeleyê cinîyan ameyî padayîş û açarnayî cayê cîya cîyayan. Tayînkerdişê qayûmî ra dima xebatkarê girêdayeyê Serektîya Daîreya Xizmetê Keye û Cinî kar ra ameyî eştiş û faalîyetê 10 merkezanê cinîyan ameyî vindetiş. Sewbîna Xeta Alo Şîdet zî teslîmê camêrdan ameye kerdiş. Qayûmo ke tayînê Şaredarîya Bîsmîlî bî zî Merkezê Cinîyan ya Nûjenî açarna Daîreya Mehrbirnayîşî. Bazara Taxe ya Cinîyan zî bê tesîr ame veradayîş.

16 serrê AKPyî de hêriş zêdîyayî

16 serrê îqtîdarê AKPyî de hêrişê hemverê cinîyan zêdîyayî. Cinîyan hemverê her vatişî de vengê xo berz kerdî û îqtîdar zî hemverê qezencanê cinîyan de hêrişan kerd dewre. Wezîrê Weşî Mehmet Muezînoglu 2ê çeleyê 2015î de şîbî pêvînayîşê keyeyêk û vatbî 'Ganî dayîkî vîşêrê dayîkbîyayîşî sewbîna ti çîyêk nêkerî merkezê xo. Ganî neslê baş bêrî resnayîş.' Nê vatişî hîna zî mezgê heme kesan de yî. Serekkomar Tayyîp Erdogan zî her firsedî de vatişê 'tewr kêm hirê domanî' vano. No vindetişo ke cayê cinîyan tena keye û karê keye de vîneno, karê bêasayîş û bêsîstem cinîyan rê meşru vîneno.

Tena cinî pakî kena?

Badê ke qayûm tayînê Şaredarîya Bajarê Girdî ya Amedî bî qeza de zîhnîyetê xizmetê zayendperestî erzîya dewre. Wesayîtê ke eşteyê bajarî arê danî ser de fotografê cinîya ke destê aye de girrêşê pakî esta, ameyo zeliqnayene û seke tena cinî pakî kena yena nîşandayene. *AMED*

Mehkema qerar daye: Goreyê huqûqî nîyo

Badê ke qayûm tayînê Şaredarîya Girdî ya Wanî ame kerdiş, qayûm cayê xeylê karmend û serekê daîreyan bedilna. Xebatkarê şaredarî yê ke cayê înan ameyî bedilnayîş muracatê Mehkemaya Îdarî ya Wanî kerdbî, la mehkema muracatan red merdbî.

Xebatkarê şaredarî dima ra muracatê Mehkemaya Îdarî ya Herême ya Erziromî kerdbî. Mehkemaya Îdarî ya Herême ya Erziromî xebatkaran heqlî vîna û qerar daye ke çîyo ke ameyo kerdiş huqûqî nîyo.

Qeraroke hemverê caardişê qayûmî de ameyo dayîş de ame dîyarkerdiş ke çîyo ke ameyo kerdiş goreyê huqûqî nîyo. *WAN*

Ganî dayîka Arîne zindan ra bivejîya

Arîn Yilmaza ke tewrê dayîka xo Esma Yilmaze Zindanê Tîpa Tyî yê Riha de mendêne, hewteyo verên bi teblîgatê Wezaretê Edaletî newe ra eşrawitî Zindanê Cinîyan yê Mêrdînî. Rewşa Arîna şenike zindanê Riha de xirar bibî û îmkanê dermankerdişî zî nêdayî aye. Arîne hetê pîyê xo Mîhdî Yilmazî ra seba rojêk zindan ra ameye vetiş.

Yilmazî derheqê rewşa Arîne de û zindanê Mêrdînî de qisey kerd û wina va: "Ma yewin rey Arîne ard verê xo. Seba ke derzînê aye estbî ma rojêke verê girewt. Arîne demêke derg nêmusa ma. Şan de her wext dayîke xo geyra. Seba ke şit şimnena zêde nêeşkena verê ma de bimana. Way û birayê aye zaf kêfweş bîyî. Pîya wext derbaz kerdî. Seba ke ma Arîne dayîke aye ra bikerê ganî ma aye newe ra bieşrawê."

Yilmazî dewamê qiseykerdişê xo de da zanayene ke Arîne seba kontrolî berdê nêweşxane û wina domana: "Rewşa weşîya Arîne hema sey xo ya. Astimê aye aver şîyo. Doktor derman nuşt û va nê dermanî benê sebebê helnayîşê estan. Arîne kîlo vindî kerdebî, la nika baş a. Seba astimî nêeşkena boye bigîra û refleksan ramojnena. Ganî Arîn û dayîke aye zindan ra bivejîyê û nê şertan de Arîne nêeşkena dayîka xo ra bivisya." *ANQARA*

Hîkayeya têkoşînê cuye ê di wayan

Leyla û Emel Muhamede Şam de cuyayêne û wayê yewbînan ê. Badê şerê Şamî koçê Efrînî kerdî û hêrişanê dewleta tirkî û komê girêdayeyê aye vera na rey koçê Qamişlo kerdî. Wirdî wayî dîyar kerdî ke Efrîn cayêke asayîş bi, la badê hêrişanê dewleta tirkî hizur vindî bi û cok ra ê mecbur mendî ke derbazê Qamişlo bibî. Nika zî Qamişlo de têkoşînê cuye danî.

Emele qiseykerdişê xo de wina va: "Wexto ke ma Şam de bî, keyeyê ma ame rijnayîş û ma bêçare mendî. Ma koçê Efrînî kerd û ewca de cuyake hizur estbî. Hêrişanê serê Efrînî ra dima ma derbazê Qamişlo bîyî. Mêrdeyê waya mi zî cuya xo vindî kerd. Nika ez, waya xo û domanê xo pîya cuyenê. Ma tîya pêwa îmkanê kêm hewl danê serê linganê xo de vinderê. Ma bawerîya xo bi şerwananê xo anê û ê do Efrînî xelas bikerê. Ma wazenê Efrîn destê dagirkeran ra bêro xelisnayîş."

Dewleta tirkî hizur nêverda

Leylaye zî wina va: "Ez 13 serrî ya xo de ameya zewicnayîş. Nika kênayêk û di lajê mi estê. Mêrdeyê mi cuya xo vindî kerd, keyeyê ey wayîrê mi nêvejîyayî. Ez ameya verê waya xo û ma piştî danî yewbînan. Badê şerî ma derbazê Efrînî bîyî û cuyêka weş estbî. Ma nika têkoşînê cuye danê ke ma bieşkê serê linganê xo de vinderê. Efrîn cayêko asayîş bi, la bi hêrişê dewleta tirkî hizur vindî bi û ma mecbur mendî ke derbazê Qamişlo bibî." *QAMIŞLO*

Kesê ke bîyî sebebê krîzî wa bedêl bidî

Konfederasyonê Sendîkaya Kedkaranê Rayapêroyî (KESK) bi sloganê 'Hemverê feqîrî, betalî, nêseyyewbînanî de pîya têkoşîm' do seba heqê karker û kedkaran biherika raşteyan. Na çarçewe de KESK mîtîngê herêmî organîze kena. Badê mîtîngê 9ê kanûne yê Samsunî do 15ê kanûne de Edene, 16ê kanûne de Amed û 22ê kanûne de zî Stenbol de mîtîngan pê bîyara.

Mîtîngê Edene do Raşteyê Ugur Mumcu de bêro viraştiş. Sekretera Cinî ya KESKî Gulîstan Atasoy û Hemserekê Pêroyî yê Sendîkaya Kedkaranê Xizmetê Sosyal û Weşîye (SES) Îbrahîm Karayî derheqê rewşa bîyaye de qisey kerdî. Atasoye dîyar kerde ke Tirkîye de demêko dergo ke hetê ekonomîye de krîz yeno cuyayîş û va: "Serê karker û kedkaran de teda zêde bîya. Îqtîdaro sîyasî nêeşkeno probleman rê bibo cewab û probleman hîna xorî keno. Ma do hemverê caadişanê AKPyî de biherikî raşteyan."

Bedêlê krîzî barê kedkaran keno

Tewr peynî Karayî qisey kerd û o zî înan va: "Îqtîdaro sîyasî êdî nêeşkeno welat îdare biekro. Îqtîdar wazeno bi zext û tedayan probleman çareser bikero. Hêrişê kesê ke heqê xo wazenî yeno kerdiş. krîz sey mehne yeno nîşandayîş û karkerkedkar şert û mercê bêasayîşî de yenî xebetnayîş. AKP wazeno bedêlê krîzî barê kedkaran bikero. Kesê ke bîyî sebebê krîzî wa bedêl bidî. Ma veng danê heme kesan ke tewrê mîtîngî bibî." *MÊRSÎN*

Çewlîg de qedexe reyna ame dergkerdene

Goreyê eşkerayîya Walîtîya Çewlîgî qedexeyo ke xeylî wexto 26 herêmanê merkez û qezayanê Çewlîgî de esto, heta 25 ê Kanûne ame dergkerdene.

Nameyê cayanê qedexekerdeyan wina yê: Merkezê Çewlîgî de Ortaçanak, Wareyê Hasarî, Girê Hasarî, Feratan, Wareyê Çirî, Newala Merdîvenî û Newala Monçu. Qezaya Azarpêrtî de Koyê Şeytanî, Newala Şeytanî, herêma Îlbey, Newala Sevkarî. Qezaya Dara Hênî de Saggoze, Buyukçag, Yenîyazi, Dîkpinar, Derman, Şekeranî. Qezaya Bongilanî de herêmê Yenîbaşak- Doguyelî, qezaya Xorxolî de Newala Horîvanîkî-Newalê Tahkîmî, Daristanê Kirkoyî, Newala Manavî û herêmê Guneşlîk û Gokçedalî. Qezaya Gêxî de herêma Çomakdere, qezaya Kanîreşî de Daristanê Karacehennemî û qezaya Çêrme de Wareyê Akimli. *ÇEWLÎG*

www.arsivakurdi.org

Êdî dem hat...



Kakşar OREMAR

Di dîroka hunera kurdî de, hunermendên ku xwezî, hesret, ser û malê xwe fedayê doza Kurdistanê kirine, ne kêm in. Li bakurê Kurdistanê karwanê hunermendên şehîd, ji ber siyaseta înkarê hîna jî dirêjtir e

Mirin zû an jî dereng, para herkesî ye. Qeder wiha ye. Wiha hatiye, dê wiha jî biçe. Tiştekî siruştî ye. Ahmet Kaya di sala 1957'an de li Meletiyê ji dayik bû û di 16'ê mijdara 2000'î de li Parîsê jiyana xwe ji dest da.

Xeberên nexweş zû li her derê belav dibin!

Zivistaneke sar bû. Di wê sir û seqema hişk de, dengek hebû ku germahiyek dabû şev û rûniştinên kurdan. Piştî ku bi darê zorê ew ji hêlîba wî derxistibûn, li xerîbiyê jî bûbû kewê di qefeseke teng de. Xemên dil û ruhê xwe yê birîndar di rojên tenêtiyê de jî bi dengekî tije hestên xemgîn beyan dikirin. Dengê ku ji nişka ve qehir û kîna hezar salan di nav sîstemeke înkarker de, bilind kiribû. Li dijî sivikatî û binpêkirina kerameta neteweya xwe bûbû awaza serhildanê.

Bi destê min nebû, xeber wisa nexweş bû ku demekê ez gêj kirim. Hêsirên çavên min û hevalên derdora min hatin xwarê. Yekî li ranên xwe da û bi dengekî bilind wiha qêriya: "…kurdan dengê xwe yê herî bilind ji dest da…", yeke din jî serê xwe li dîwara dida û bi dengekî bilind digiriya: ***"Parîs ji me çi dixwaze, ma Yilmaz Guney, Dr.Qasimlo û têhnatiya Per Laşezê neşikênandibûn! Ma hêj zû nebû?!..."***

Li derveyî vîna me bû, her kesî tiştek digot. Belê xebera reş, xebera ku ji aliyê medyaya tirkên şovenîst ve bi xweşî û germî hat pêşwazîkirin, mirina hunermend Ahmet Kaya bû.

Sîstema Kemalîzmê, sîstema qirkirin û fermanên tije jenosîd, neviyên bi dek û dolabên Osmaniyan, neyarekî siyaseta xwe ya qirêj ku hê jî hebûna neteweya kurd înkar dikin, ji dest dabûn. Salên dûr û dirêj bûn neviyên gurên Boz (Bozkurt) li rêyekê digerîn ku dengê Ahmet Kaya di qirika wî de bifetisînin. Lê êdî ew jî ne bêxwedî bû.

Xweziyên Ahmet Kaya

Daxwazên wî pir bûn. Li pey wê roja dîrokî ku bi dengekî bilind behsa kurdbûna xwe kiribû, êdî di jiyana xwe de derbasî pêvajoyeke nû bûbû. Çimkî ew li ber bû ku gelek tiştan ji kurdan re bike: Bi zimanê şîrîn ê kurdî stranan bibêje û berhemên dewlemend biafirîne, rêzefilman çêbike û tê de derdê gelê xwe nîşanî her kesî bide. Hezar mijar û plan di dil û mejiyê wî de li ber girnijîna jiyanê bûn. Serhildana wî dê bi serê xwe şoreşeke mezin biafiranda.

Mixabin, hezar heyf ku di temenekî tije hêz û hez agirê wê evîna giranbiha vemirî. Tenê dilê wî nebû ku ji kar disekinî, milyonan dilên din jî tevî dilê wî yê mezin diketin şîneke bêdawî.

Êdî bi dehan projeyên nivco çûn bin axa sar, lê ne li axa Kurdistanê belkî li ser axa xerîbiyê. Belê bêguman mirina li xerîbiyê jî nexweş e. Kesê ku derdê xerîbiyê nekişandibe, belkî nizane ka ez çi dibêjim!

Ev cara duyem bû ku du hunermendên mezin, du stêrkên geş, bêhesret li xerîbiyê bi dinyayek tije xwezî, li dûrî Kurdistana delal, ji nava me diçûn: Yilmaz Günay û Ahmet Kaya.

Yilmaz ku ji reşezindanên komara faşîst a Tirkiyeyê reviyabû, li Parîsê wefat kir û mirinê derfet neda wî ku pirojeyên xwe yên dewlemend peya bike.

Planên wî wisa kûr û dûr bûn ku ger tê de bi ser biketa, ez bawerim niha rewşa huner û sînemaya kurdan di asteke din de bû. Wan salan du hunermend hebûn ku mil bi milê partiyên siyasî, doza kurdîniyê dikirin. Şivan Perwer bi dengê xwe yê dawudî nasnameya muzîk û hunera kurdî derbasî qonaxeke din kiribû. Dengê wî dilê generalên tirk, sedamê cinayetkar, Şahê Pehlewî û mîratgirê wî Xumêyniyê xwînrij bi tirseke mezin lerzandibûn. Û Yilmaz Guney jî bi filmên xwe yên teje peyam hêdî-hêdî ji raya cîhanê re dida xuyakirin ku medeniyeta ku rayedarên komara Tirkiyeyê li ser bi qareqarin, tev ji binî de derew e.

Dema xebera mirina Ahmet Kaya, di nav raya giştî de belav bû, pirs li pey pirsê di mejiyê mirovan de dihatin û diçûn: "Gelo çima em evqas bextreş û bêdisiûd in ma ev bû qedera me? Ev pirsek bû ku wê rojê her kesî ji xwe dikir.

Karwanê hunermendan

Di dîroka hunera kurdî de, hunermendên ku xwezî, hesret, ser û malê xwe fîdayê doza Kurdistanê kirine, ne kêm in. Karwanê hunermendên şehîd dûr û dirêj e: Erdewan Zaxoyî û Dilşad Merîwanî ji başûrê Kurdistanê, Serhed, Mizgîn, Çiya, Sefkan, Hogir, Delîla û çendîn kesên din ji bakurê Kurdistanê, Cemal Moftî ji Rojhilatê Kurdistanê û Mihemed Şêxoyê daxbarê bindestî û perîşaniya gelê xwe ji rojavayê Kurdistanê, ji wan hunermendan bûn ku bi destê dewletên dagirker hatin şehîdkirin an jî rêya mirinê li ber wan vekirin.

Li bakurê Kurdistanê karwanê hunermendên şehîd, ji ber siyaseta înkarê hîna jî dirêjtir e. Hunermendê dawiyê ku ji ber helwesta xwe ya kurdxwaziyê neçar ma ji hêlîna xwe bireve, "Ahmet Kaya" bû. Jiyana Ahmet Kayayê dengxweş, çîrokeke dûr û dirêj e.

Jiyan û xweziyên çaxê zaroktiyê

Ehmed Kaya di 28.10. 1957'an de li bajarê Meletî di nav malbateke karker û zehmetkêş de li bakurê Kurdistanê hat dinê. Bavê wî di febrîqeya mensucat (pate çêkirinê) ya bajarê Meletiyê de bi evînek bêdawî dixebitî ku zarokên wî heya dawiyê xwendina xwe berdewam bikin. Ahmet Kaya di nav pênc zarokên malê de, ji tevan biçûktir bû.

Rojekê dema ku Ahmet Kaya hêj zarok bû, bi tembûrekê vegeriya malê, bavê wî jî jê re wiha got: ***"Ev daxwaza te ya ji bo hunerê, ji min re jî xweziya herî mezin e."***

Û êdî ew hez rojê ji roja din zêdetir hestên wî şa dikirin.

Stran û pêngava yekemîn

Sala 1966'an Ahmet Kaya hêj 9 salî bû ku li 24'ê tîrmehê de ji bo pîrozkirina roja karkeran, bo yekemîn car derket ser dikê. Ew roja tije xweşî di jiyana wî û malbatê de bû bîranînek nemir.

Di dema bêhnvedanên havînê de ku xwendingeh dihatin girtin, Ahmedê ciwan bi hêzeke bêdawî, mîna şagirdekî li ber destê şofêrê mînîbusê dixebite. Ji temenê zarokatiyê ew jîr bû û rewşa aborî-civakî ya malbatê jî fêhm dikir. Ji bo wê jî dixwest hevkariya bavê xwe yê zehmetkêş bike.

Dema ku birayê wî yê mezin (Başar) ji aliyê dewletê ve tê girtin, bi tembûra xwe ya biçûk strana xwe ya yekê "Bîr Volkswagon alacagim, adini "Başar" koyacagim (Ez ê tirimbêleke Volkswagon bikirim û navê wê deynim Başar) çêdike.

Di pêgehiştineke wiha de, Ahmet Kaya hemû sêlikên (pilak) hunermendê bi nav û deng (Ruhî Sû) dikire û di nav hevalên xwe de jî belav dike. Di wan salan de wî pantolên fireh û kirasên mildirêj dikirin ber xwe û porê serê wî jî dirêj bû. Dixwest tenê weke xwe be. Ew ciwanekî nûkar bû ku ji bo paşerojê bîr û ramanên kûr û dûr di mejiyê wî de hebûn.

Piştî ku bavê Ahmed ji aliyê febrîqeya mensucatê ve teqawit dibe ji Meletiyê koçî Stenbolê dikin û li taxa Kocamustafapaşa, bi cîh dibin.

Bi hatina salên 1970'yan re di nav civaka Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê de gûherandinên siyasî û germ dest pê dikin. Ahmet Kaya dixebitî ku xwendina xwe ya navîn bi dawî bîne, lê dema çavên xwe baştir vekirin dît ku di nav wê civatê de ye ya ku jê hez dikir. Zû pêdihese ku çanda wir û Meletiyê ji hev cuda ne. Ew ketibû nav deryaya çandeke nû û cuda ji çanda xwe ya kurdewarî. Rast e ku baş bi zimanê xwe yê zikmakî nedizanî lê atmosfera jiyana wî ya li Kurdistanê ji Stenbolê cuda bû. Êdî wiha ketibû nav cîhaneke din û neçar bi keneke tije hêvî dest bi guhdarîkirina stran, marşên şoreşgerî û stranên hunermend (Ruhî Sû) dike. Piştî çend salan ew vê rastiyê înkar nake ku di bin bandora vî rengê muzîkê de maye. Lê gera wî ya ji bo xwepeydakirin û gera li pey dengê xwe, nasekine. Ew qet çaxê xwe bi valayî derbas nake û her tim bi tembûra xwe re mijûl e û ji xwe re distrê. Şev û rojan nizane westan çi ye.

Di wan salan de Ahmet Kaya dixebite ku mîna mamosteyê xwe (Ruhî Sû) hînî lêxistina tembûrê bibe û bêhtir dixebite ku di cîhana hunerê de, sitîl an jî rêyekê ji xwe re peyda bike.

Ahmet ji aliyekî di cîhana xwe ya muzîkê de wer bûbû, ji aliyekî jî îdiayên guherandinên jiyanê di raman û bizavên wî de geş dibûn. Ew bi wê dînamîzma ciwantiyê, dijberiya xwe ya li dijî sîstema serdest jî aşkera dikir.

Ji salên 1980'yan û pê de di jiyana wî de, guherandinên bingehîn pêk tên û êdî ew rêya xwe hildibijêre.

Di sala 1985'an de Ahmet Kaya ku tenê bi rêya muzîkê ramanên xwe vedibêje, wiha got: ***"Êdî dem hat" û stranên ku ji xwe re çêkiribûn, radike û kasêta xwe dibe Unkapanê ku li Stenbolê cihê tomarkirin û weşana berhemên hunerî bû. Ew dixwaze kasêtekê bi deng û istîla xwe ya nû derxîne piyasê. Herkesê ku guhdarî wî dike, jê re dibêjin: "Tu kes vê muzîkê naecibîne û rû nadê..."***

Lê Ahmedê nûgihîştî û xwedî hêzek bêdawî, kesek nebû ku ji van gotinan bitirse an jî di dewama rêbaza xwe de dilsar bibe.

Albûma yekemîn

Roj derbas dibin, êdî ew digihîje wê biryarê ku bi îmkanên xwe yên şexsî û bi hevkariya çend hevalên derdora xwe, albûma xwe ya yekemîn; ***"Aglama Bebegîm"*** (Megrî Dergûşa Min" çêbike. Lê albûma wî ya ku atmosfêra wê ya siyasî, desthilatdaran di wan salan de naveroka wê nedipejirand, zû hat komkirin. Îtiraza wan a li dijî vê biryara dewletê digihîje encamê û bi destûra dadgehê albûma Ahmet Kaya ya yekemîn "Aglama Bebegîm" bi awayekî azad tê belavkirin û firotin.

Ji 12'ê îlona sala 1980'yan û pê de ku Kenan Evren û desthilatdariya leşkerî li Tirkiyeyê û Kurdistanê hat ser kar, xwendevanên zanîngehan, malbatên girtiyên di girtîgehan de, saziyên alîgirên aştî û demokrasiyê, komên kesayetî û dijberên dewama rewşa awarte, tev dixwazin careke din di Tirkiyeyê de, tovê demokrasiyê biçînin. Li dijî ramanên generalekî otorîter dijberî zêde ne. Ev çînên civakî tev hêdî hêdî guhdarên stran û muzîka Ahmet Kaya pêk tînin. Bi vî awayî Ahmet Kaya jî di nava bazara hunera Tirkiyeyê de rêyeke nû ji xwe re vedike.

Demeke kin piştî vê Ahmet Kaya albûma xwe ya duyemîn ***"Acilara Tutunmak"*** çêdike. Êdî di vê xebata wî ya nû de, hemû çînên civatê yên sivîl û siyasî, rewşa jiyan û îdeyên xwe tê de dibînin.

Helbestvanên mîna "Ahmed Arif, Enwer Gokçe, Hasan Huseyîn Korkmazgîl" bi helbestên xwe, bi hunermend Ahmet Kaya re ne. Helbestên wan piranî xwedî peyamên siyasî bûn. Di çaxê çêkirina albûma xwe ya duyemîn de, deriyê siûda wî ji nû ve vedibe û yek ji kesên ku di xebata repertuara wî ya nû de li kêleka wî ye, keça dêrsîmî Gulten Hayaloglu ye. Ew ji wir û pê de hev nas dikin û di tomarkirina berhemên albûma xwe ya duyemîn de êdî Gulten jî li ba wî ye.

Di çaxê çêkirina albûma sêyemîn de Gulten helbesta bi navê ***"Şafak Turkusu"*** (Strana Şefeqê) ya girtiyekî yê bi navê (Nevzat Çelîk) ku bi îdamê hatibû mehkûmkirin, datîne ber Ahmet Kaya û jê re dibêje: "Vê helbestê bike stran û pêwîst e tu wate û naveroka wê bigihînî guhê pareke mezin a gelê civakê." Her çend di destpêkê de Ahmed li ser zehmetiyên vê helbesta "Azad an jî şiîra nû" ji bo stranê bi Gultenê re axivî jî, lê wî ew helbest kir stran û navê albûma xwe ya sêyemîn jî li ser îftixara navê girtiyekî azadiyê danî "Şafak Turkusu".

Alahilgirê şoreşeke nû

Wî bi hevkariya xanima xwe Gultenê ew bayê hestên germ ku ji nav ruhê mirovan dihat, girt û ew derdê dilê girtiyên ku li benda îdamê bûn û bi hezaran girtiyên zindanan û rewşa ku malbatên wan tê de bûn, kiribû stran û awaz. Dengê wî bûbû merhema dilbirîndaran. Dilbirîndarên ku êşa wan bindestî û zordariya faşîzimê bû. Kurd, tirk, laz, çerkez, karker, rewşenbîr û zana, tev bi ramanên wî re bûn. Ew êdî bûbû alahilgirê şoreşeke nû.

Di wan salên reş yên ku 12'ê îlonê de bi xwe re anîbûn, dengê Ahmet Kaya bûbû dengê hemû dijberên zagonên generalên tirk û piştî Şivan û Gulistan Perwerê ku bi zimanê kurdî muzîka protestokirinê li her derê belav kiribûn, êdî "Muzîka Protestokirinê" bi zimanê tirkî jî di nava gel de cihekî xwe yê taybetî vekiribû.

Di 4´emîn albûma xwe ya bi navê ***"An Gelîr"*** (Dem Tê) Ahmet Kaya bi helbestên Atîlla Îlhan, Hasan Huseyîn Korkmazgîl û Ulku Tamer ku di vê albûma xwe de kiribûn stran, dîsa hê jî ji berê baştir ber bi pêş ve, pêngavên baş avêtin. Ew êdî bi aranjorên profesyonel re jî dixebitî û berhemên baş di nav gelê ku têhniyên azadiyê bûn, belav dikirin. Stranên ku wêrekî di nav gel de belav dikirin û civak bi 'dema nû' dihesandin. Ramana "Pêşdeçûn û karek ji karê berê baştir kirin" ji Ahmet Kaya re bibû armanca sereke.

Kaya di albûma xwe ya 5´emîn ***"Yorgun Demokrat"*** (Demokrata/ê Westiyayî) de ji xeynî hevkariya helbestvanên navdar, vê carê bi rêya Gultenê re bi birayê wê yê helbestvan Yusuf Hayalogluyê dêrsimî re jî dest bi xebateke nû dike. Ev hevdîtina wan jî rasthatineke herî baş û durist di jiyana wan her duyan de bû. Çimkî ew her du kurên axekê ango axa Kurdistanê bûn ku di nav xem û derdên gelê xwe de pijiyabûn. Yusuf Hayaloglu bi albûma Ahmet Kaya "Yorgun Demokrat" bi pêşniyara xwişka xwe Gultenê dest bi çêkirina helbestên stranan ji bo Ahmed Kaya kir. Hevkariya wan her duyan bû sedem ku ev berhemê Ahmet Kaya hem bi naveroka xwe û hem jî di wê atmosfera Tirkiyeyê ya girtî û fetisandinê de, bandora xwe di nav mejiyê bi milyonan mirovên demokrat de, bide xuyanîkirin… *(didome)*

www.arsivakurdi.org